



Research Article

International Journal of Kurdish Studies

11 (1), pp. 114-130

<http://www.ijoks.com>

Edebîyatê Modern yê Zazakî de Tesîrê Xizirî

Ilyas AKMAN¹ 

Received: Jan 24, 2024

Accepted: Feb 14, 2025

Kilmvate

Xizir, yew şexsiyeto dînî yo ke tesîrê ey zaf welatan de est o. Derheqê ey de zaf rîtuêlî est î û toy cayan de o şexsiyetanê tewr muhîman ra yew hesebîyeno. Goreyê Zazayan zî o yew keso zaf muhîm o. Bitaybetî Zazayî ke Elewî yî cûya rojane de zaf ca danî ey û toy rîtuêlî ke derheqê ey de yî anî ca. Nuşttoxê Zazayan zî, bitaybetî nuşttoxî ke Elewî yî, Xizirî rê ehemîyet danî û eseranê înan de kê raştê Xizirî yenî. Wendoxî, eseran ser ra derheqê Xizirî de wayîrê melumatî benî. Mîsale pey eseran wendoxî bander benî ke samedê Xizirî nameyî sey Xiziro Kal, Kalo Sipî, Xizirê Kelek û Gemîyan, Xizirê Saeta Tenge, Asparê Bozî şuxulîyenî. Hewna ê bander benî ke rîtuêlî sey roceyê Xizirî, qawita Xizirî, nîyazê Xizirî, loqmeyê Xizirî est î. Na xebate de ma ceribna ke tesîrê Xizirî edebîyatê modern yê Zazakî de senê hewa yo tesbît bikî.

Kilît Çekuyî: Edebîyatê Zazakî, Xizir, Edebîyatê Modern, Roman, Şîr, Hikaye

Recommended citation:

Akman, I. (2025). Edebîyatê Modern yê Zazakî de Tesîrê Xizirî. *International Journal of Kurdish Studies*, Volume 11 (1), 114-130, DOI: <https://doi.org/10.21600/ijoks.1626461>

¹ Ph.D. Can, Mardin Artuklu University, Mardin, Türkiye, e-mail: ilyas-akman@hotmail.com
ORCID: <https://orcid.org/0000-0003-2146-2100>

The Influence of Khidr in Modern Zaza Literature**Abstract**

Khidr is an important figure whose influence is seen in many countries. There are many rituals about him and in some regions he is considered one of the most important religious figures. According to the Zazas, he is an important figure. Especially Alevi Zazas give a lot of place to Khidr in their everyday lives and perform some rituals about him. Zaza authors, especially Alevi authors, give importance to Khidr and Khidr is encountered in their works. Readers learn about Khidr through works. For example, readers learn through the works that names such as Old Khidr, White-Bearded Khidr, Khidr of Kelek and Ships, Khidr of Hard Times, and Grey Horseman are used for Khidr. Readers also learn that there are rituals such as Khidr fasting, Khidr 's kavut, Khidr 's niyaz, Khidr 's morsel. In this study, the influence of Khidr on modern Zaza literature was tried to be revealed.

Keywords: Zaza Literature, Khidr, Modern Literature, Novel, Poetry, Story

Modern Zaza Edebiyatında Hızır'ın Etkisi**Öz**

Hızır, etkisi birçok ülkede görülen önemli dini bir şahsiyettir. Onun hakkında birçok ritüel vardır ve bazı bölgelerde o, en önemli dini figürlerden biri olarak görülür. Zazalara göre de Hızır önemli bir şahsiyettir. Özellikle Alevi Zazalar gündelik yaşamlarında ona çok yer verir ve onun hakkındaki bazı ritüelleri gerçekleştirirler. Zaza yazarlar da, özellikle Alevi yazarlar, Hızır'a eserlerinde yer verirler. Bu nedenle okurlar eserler vasıtasıyla Hızır hakkında bilgi sahibi olabilmekteler. Örneğin okurlar eserler aracılığıyla öğrenirler ki Hızır için Xiziro Kal (Yaşlı Hızır), Kalo Sipî (Beyaz Yaşlı/Ak Sakallı Yaşlı), Xizirê Kelek û Gemîyan (Kelek ve Gemilerin Hızır'ı), Xizirê Saeta Tenge (Dar/Zor Zamanların Hızır'ı), Asparê Bozî (Boz Atlı) gibi isimler kullanılır. Ayrıca Hızır orucu, Hızır kavutu, Hızır niyazı, Hızır lokması gibi ritüellerin olduğunu öğrenirler. Bu çalışmada Hızır'ın modern Zaza edebiyatındaki etkisi ortaya konulmaya çalışılmıştır.

Anahtar Kelimeler: Zaza Edebiyatı, Hızır, Modern Edebiyat, Roman, Şiir, Hikâye

Destpêk

Dinya de zaf welatan de şexsîyetê dînî û mîtolojîkî est î. Nê şexsîyetan ra toyî zaf welatan de xo rê ca veynenî. Xizir inohewa qarekteran ra yew o. O, Muslumanîye, Cihudîye û Fileyîye de xo rê ca veyneno. Toy vateyan de sey şexsîyeto dînî toy vateyan de zî sey şexsîyeto mîtolojîk nawnîyeno (Boratav, 2012, 77). Rojhelato Mîyanin, Asyaya Mîyanin, Balkan û Anatolya de derheqê ey de bawerîyî û vateyî est î. Mîsale Azerbaycan de aşma sibate de roşanê Xidir Nebîyî; Balkanan de 5ê gulane de Xidirellez yeno bimbarek kerdiş. Benetî Kazakan de zî yeno bawer kerdiş ke Xizir 21ê adare de asmên ra yeno war û tebîetî rê gan dano (Çınar, 2020, 64). Samedo ke benetî şaran de tesîrê ey zaf o, zaf cayan de tirbeyî ke vacîyenî “tirbeyê Xizirî” est î. Mîsale Teyna Hatay de 327 tirbeyî est î û nînan ra nameyê 51ê “tirbeya Xizirî” yî. Nê tirbeyan de rengê kiho û sipîyî hâkîm î. Rengê sipî bêguneyî, rengê kiho zî Xizirî temsîl keno (Türk, 2010, 229). Seke ame vatiş benetî Muslumanan de Xizir yew şexsîyeto muhîm o. Bingeyê ci yew sure ya. Sureya Kehfî de behsê Hz. Mûsâ û yew keso zana beno. Hz. Mûsâ rayîr de raştê nê kesî yeno. Quran de samedê nê kesî “keso ke hetê ma ra ey rê îlm ame dayîş” vacîyeno. Hz. Mûsâ wazeno ke ey rey de embazî biko û ey ra îlm bander bibo. No kes vano ke Hz. Mûsâ nêşkeno verê çîyano ke o sirranê nêzano de sebr biko. La Hz. Mûsâ vano o sebr keno û yew babete de zî ey rê îtiraz nêkeno. Pey nê şertî keso zana îzn dano Hz. Mûsâyî û pîya kuwenî rayîr. Verî, yew keştî de roşenî û keso zana keştî kulî keno. Hz. Mûsâ ca de îtiraz keno û vano: “Samedo ke ti însanan bifînî awe to keştî kulî kerdi?” Keso zana zî vano: “Mi to ra va ti nêşkenî sebr bikî!” Hz. Mûsâ xetaya xo qebl keno û vano reyna ey rê îtiraz nêkeno. Toyna şonî û raştê yew gedeyî yenî. Keso zana nê gedeyî kişeno. Hz. Mûsâ îtiraz keno û vano ey yew gureyo xirab kerd. Keso zana hewna vano: “Mi to ra va ti nêşkenî sebr bikî!” Hz. Mûsâ efê xo wazeno û vano çina bibo zî o hînî îtiraz nêkeno. Hewna vecînî rayîr û resenî yew dewe. La na dewe de kes nêwazeno înan misafir biko. Keso zana dewe de veyneno ke yew dês toy monayo ke biricîyo û dês raşt keno. Hz. Mûsâ vano dewican nêwaşt ke înan misafir bikî la ey bêpere dêsê înan raşt kerd. Keso zana badê yew bi yew sirran ey ra vano: “Wayîrê keştî feqîr bi. Aver de qiralo zalim est bi û keştîyanê başan rê dest ronayênî. Mi keştî bi zanî biqusir kerd. Eke ma behsê gedeyo ke mi kişt bikî. Maya û pîyê gedeyî mumîn î. Ma tersay ke no gede derheqê înkârî de zor bido înan. Coka ma waşt ke Homa înan rê yew gedeyo hîna salêh bido. Dêso ke mi raşt kerd yê di gedeyê seyî yo. Binê dêsî de gencîne est o. Pîyê gedeyan yew mumîno salêh bi. Homa yî waşt ke gedeyî xort bî û gencîneyê xo vecî” (Mealê Quranê Kerîmî, 2012, Kehf 18/60-82). Çimeyanê Îslamî de no keso ke Hz. Mûsâ ey rê

embazî keno rê Hadir vacîyeno. La Hadir name nîyô yew leqem o û çimeyan de sey Hadir, Hadr, Hıdr ca gîno. Manaya Hadirî “kiho, cayo ke kihoyî ey zaf o” ya. Zazakî de semedê ci Xizir vacîyeno. Babeta qeyê semedê Xizirî inohewa yew leqem şuxulîyayo de konsensus çinî yo. Toy şîroveyî nê yî:

I. O, wexto ke herra wişke ser de roşeno ci keno kiho

II. O, wexto ke nimac keno derûdorê xo keno kiho

III. Ey xo dekerdo zereyê âbê heyatî û rengê kihoyî girewto

IV. Rîyê ey bereqîyaye yo û viraştîşê ey rind o

V. Ey hênîyê Cenetî ra awe şimit a

VI. O, wexto ke cayo kihoyî de biroşo cilê ey rengê kihoyî gînî (Öztürk, 2003, 259-260).

Derheqê Xizirî de toy melumatê umumî est î: Ey şerbetê bêmergî şimito coka bêmerg o; heme ca û meknan de eşkeno nişke ra vecîyo meydan; însanan rê ardim keno û înan rê bereket ano. O wayîrê sirranê îlahî yo; comerd û rî huyaye yo; cilanê kiho xo ra dano; wayîrê estorî yo (Döğüş, 2015: 78- 79). La toy xususan de zî melumato qetî çinî yo. Mîsale babetî sey o yew welî yo yan nebî yo; însan o yan milaket o de melumato qetî çinî yo (Ertuğrul, 2021, 293-300). Seke aseno Xizir, zaf welatan de tesîrê xo ronayo û derheqê ey de cîya cîya bawerîyî est î. Edebîyatê modern yê Zazakî de zî kê raştê Xizirî yenî.

Çende Xizir hem semedê Sunîyan hem zî semedê Elewîyan yew şexsîyeto muhîm bibo zî gama ke ma edebîyatê Zazakî de eseran ra ewnînî hîna zaf nuştuxê Elewîyî eseranê xo de ca danî Xizirî. Xora zanîyeno ke Dêrsim de duayan de hîna zaf nameyanê “Ellah”, “Xizir” û ewlîyayan vêrenî (Eren, 2011, 446) û Dêrsimijî zonê xo ra vanî “zonê Xizirî” (Arpa, 2012, 545). Ma eşkenî nê deyîrî sey mîsale binawnî:

Zonê ma zonê Xızirio

Thonê ma thonê Xızirio

Çıqa ke; seré kou, werté birriyo

Caé ma; ware u xané Xızirio (Tüzün, 2012, 180).

Nuştoxê kitabê *Budelaê Girşî* zî eynî çî ano ziwan: “Zone ma zone xızirio / Thone ma thone xızirio” (Mergariji, 1996, 16). Seke nê çimeyan de zî aseno Elewîyî bawer kenî ke ziwan û tonê înan ziwan û tonê Xizirî yo. Cayê înan zî ware û keyeyê Xizirî yo. Xizir û Elewîyî hende zaf dekewtî têzere ke toy kesî ke Elewî nîyî zî hînî inohewa fikirîyenî. Romanê *Sosine û Gulîzare* de qumandan nê fikrî ano ziwan. Leşkerî gama ke dewij Cemalî weynenî vanî qey o endamê rêxistine yo û ey ra vanî embazî ey ko re yî. Benetî înan de no dîyalog vêreno:

-Ti kesî nas nêkena hi!

-Xizir bo nas nêkena!

-Himm, bi Xizirê Qizilbaşan ma xapnenê!

-Bismîlahî pîyê mi! Xizir, ê ma pêrunê wo (Sertkaya, 2013, 310).

Wexto ke dewij vano o kesî nêşinasneno Xizirî xo rê şahid nawneno. O wext qumandan vano o wazeno ke pey “Xizirê Qizilbaşan” înan bixapêno. Yanî fikrê ey de Xizir yê Qizilbaşan/Elewîyan o.

Roman, şîr û hikayeyî ke bi Zazakî nusîyayî de cîya cîya taybetmendîyan û kontekstan de ca dayîyeno Xizirî. Ma inkey eşkenî nê babetan ser biteferuat vindirî.

1. Xizir Sey Keso Ke Ey Ra Ardim Wazîyeno

Gama ke kê behsê Xizirî bikî qala verêna ke yena vîrê kê “ardim” a. Xizir keso ke teberê wext û mekanî de yo û bawer beno ke wexto ke kesî ke tenganeyî, bêçareyî de yî ey ra ardim biwazî ca de reseno înan û zehmetanê înan orte ra wedarneno (Türkdoğan, 2004, 19). Edebîyatê Zazakî de zî Xizir no kontekst de xo rê ca weyneno. Mîsale romanê *Kilama Pepugî* de wexto ke Xaç vindî beno Bakil zaf qehrîno. A roce ne şamî weno ne zî hewn dekuweno çimanê ey. Nê cumleyî fekê ey ra vecînî: “Ya Xiziro kal. Têyro turî nika o layîke ma werdo xelesno. Ya Xizir ma ti esta, ci rê wayîrtîne bike” (Gündüz, 2000, 209). Xaç eslê xo de Armenî yo. La wexto ke Armenî kişîyenî toy Kurdî gedeyanê Armenîyan rê wayîr vecînî û vanî ê gedeyê înan î. Inohewa nê gedeyê Armenîyan mergî ra feletînî. Bakil zî Xaçî rê wayîr vecîno û vano Xaç lacê ey o. Çende Xaç mergî ra feletîyo zî hetê psîkolojîkî ra halê ey baş nîyo. Çunkî ey heme komê xo û keyeyê xo vîndî kerdî û tersê mergî ey de est o. Coka rocêk orte ra vindî beno û şono cayo ke kes nêzano. La no hal Bakilî zaf qehrîno. O hînî toy werd weno û toy rakuweno. Bi rocan Xaçî geyreno. No hal

de Xizirî ra ardim wazeno. Çunkî goreyê bawerîya ey Xizir eşkeno ey talukeyan ra bipawo û wayîrê ey vecîyo. Xora goreyê toy Elewîyan Xizir teyna yew keso bimbarek nîyo o nême Homa hesebîyeno. Coka benetî nê Elewîyan de heme kesan ra zêde Xizirî ra ardim wazîyeno. Zafê waştîş û temenîyî hewaleyê Xizirî benî. No roman de zî Bakil Xizirî ra ardim wazeno û vano wa Xizir wayîrê ey vecîyo û heme belayan ra bipawo.

Romanê *Her Çi Beno Sanike* de zî hama rîpela verên de eynî kontekst de ca dayîyeno Xizirî:

Sîpela ke va, Xızıro Khal amêne mordemi viri. Vore ke estêne gîlê kou, sarri tenêne xo ver dêne ke kar herey mekuyo, hona ke vore nêreste, ra u rêçi nêgurete binê bandıra xo, gunê kar u gure bıqediyêne. Ondêr welatê ma heni bi. Vore ke gîlê kou ra roc be amêne cêr, dae ra pia şindorê dina ke amêne cêr. Vore ke rınd her ca guret xo ver, ra u rêçi biriyêne, her dewe onciyêne, kotêne zerê tholê xo, xo sero biyêne ju dina. Va bibo, her kes xorê bes bi. Eke bes nêbi, nafa ke Xızır restêne hawar (Çiya, 2001, 5-6)

Roman de rîpela verên de halê welatî zimistan de senê hewa beno ser vindirîyeno. Nê wextan de vewre heme çîyî gîna binê bandura xo. Hîni hukmê aye ronîyeno. Nê wextan de şar ceribneno ke xo rê bes bibo. La rocî yenî ke ê, verê hukmê vewre de bêçare monenî. Nê wextanê tengan de Xizir yeno vîrê însanan. Seke aseno wextanê tewr tengan de Xizir yeno vîrê şarî û o, sey yew feletnayox veynîyeno.

Hîkayeya “Gule” ke kitabê *Teberik* de ca gîna de zî behsê vewre, tenganî û Xizirî beno. Hîkaye de qarektera Gule hama des û hîrê serre ya û zaf xidar nêweş kuwena. Halê aye hende xirabo ke heme keye dekuweno binê decanê pîlî. Rocanê zimistanî yo û vewre heme ca girewto binê bandura xo. Destê însanan ra zaf çî zî nêyeno. Qehrî ra pî, bi aşman erdişa xo nêqesneno. Timûtim keynaya xo fikirîyeno. Maye zî eynî hewa qehrîna. Rocêk her kes pey qîrîya maye haya beno. Çunkî fekê Gule ra gonî yena. Gama ke pî no hal veyneno vewre û pûkî xo vîr ra keno û ceribneno ke keynaya xo pey tawûg bero nêweşxane. Keyna gîni tawûg ser ronênî û pî xo erzeno zereyê vewre û pûkî. Maye zî nê duayî kena: “Xizir şima de bo, wa Xızıro kal kêneya mi, mi rê biverdo” (Çiçek, 2010, 93). Destê maye ra çîyêk nêyeno. Verê nê halî de bêçare ya. La Xizir sey wayîrê bêwayîran û bêçareyan veynîyeno coka a zî sey yew hemleyo tewr pîl Xizirî ra ardim wazena. Hîkayeya “Şiliya Usari” ke kitabê *Reuka Doy* de ca gîna de zî yew halo bidemende est o.

Eyam zaf xirab o. Inohewa yew roce de yew gedeyo şinik heywanan beno çerênayîş. La çîyî ke qewîmî ters dekenî zerreyê ey:

Hetê Gıngımı de gıme-gıme hewra biye zaf. Mij u duman hetê ma ser amêne. Ters kewt zerê mî. Ez bulusk ra zaf tersêne. Bulusk dano kemera ra, dano dara ra... Raa dawari de dari çinêbi, hama kemeri zaf bi... Hama herç ke şî, gurayîşê hewra biyêne zêde. Mî ki xo-xode duwa kerdêne. Mî va “bismillah.” Îsan ke vaco bismillah bulusk nêdano isan ra. Çımke bulusk dano cin u pêriyanê xıraba ra (Koêkorta, 2001, 31).

Gede Gurriya hewrî ra, virsik ra, tarî ra zaf terseno. Coka dest pêke duayan keno. O wext yew dewijo pîl, Elî, gedeyî veyneno û şono ey het. La rewş hende xirab o ke Elî zî terseno û gedeyî gîno binê qaputa xo. Badê zî nê duayî keno: “Ya pirê mî Sey Nesemi! Ya Celal Abbas! Ya Xızirê khêlek u gemiya, şıma kesi tenge de nêverdê! Ma u cirananê ma ra xırabe duri berê!” (Koêkorta, 2001, 33). Ê, tengane de yî û şexsiyetanê muhîman ra ardim wazenî. Nînan ra yew zî Xizir o. Şîıra “Çi Taw Şilîye Bivaro” ke kitabê *Roj Ma De Şewle Dano* de vêrena de zî têqilî Xizir û eyamî est o:

Şilîye bivaro

Destê maya mi çareyê mi de bo

Demê verî

Xij benê çimanê mi ver de

Xiziro Kal vecîno zereyê ju şewe de (Gedîk, 2012, 11).

Şîire de qarekter vano ke şilî timutim mergî, tenayî û maya ey ana vîrê ey. Şewanê şilî de maya xo hîs keno. Nê wextan de yewna kes vecîno meydan: Xizir. Qarekterî maya xo vindî kerdo û qehirîyaye yo. La a game Xizir zereyê şewe de vecîno. Xizir hewna yew însano qehirîyaye het de peyda beno.

Şîirî ke kitabê *Gula Xizirî* de vêrenî de zî Xizir no kontekst de xo rê ca veyneno. Ma eşkenî şîıra “Nêweş A” nimune bidî:

Nêweş a gula mi çeyê xo ra şîya
 Îmdadê ma de bê Xiziro Kal
 Weş û war ke mi rê bîcê bîya
 Îmdadê ma de bê Xiziro Kal (Başî, 2012, 92).

Seke aseno waştî nêweş kuwena û keye ra şona cayanê dûran. O wext heskerdox bêçare moneno û Xizir yeno vîrê ey. O, Xizirî ra îmdad wazeno. Wazeno ke Xizir waştî baş biko û ey rê tepa bîyaro. Heme şîr de hîrê rey “Îmdadê ma de bê Xiziro Kal” vano. Şîra “Xatir Waşt” de zî eynî rewşe est a: “Mi ra xatir waştî şîya / Xizir mi rê bîcê bîya / Bêdost mendo ez xo rê” (Başî, 2012, 61). Keyeyê waştî dewe ra bar keno şono cayanê dûrî. No hal heskerdoxî qehirneno û muhtacê ardimî beno. O zî Xizirî ra ardim wazeno û wazeno ke Xizir waştî ey rê tepa bîyaro. Nê xususîyetan ra toy kesî ey ra vanî “kaşîfê ma.” Kitabê *Pune* de no îfade vêreno: “Nasib bo / Xizir ma rê kaşîf bo” (Çiçek, 2024, 63). Qarekter wexto ke wazeno bireso waştîşê xo Xizirî xo rê sey kaşîf weyneno û nasibê xo ey ra wazeno.

Wexto ke waştîşê însananî ke Xizirî ra ardim wazenî bîyî ca bawer kenî ke Xizir ney înan rê bexş kerdo. Kitabê *Hirê Kıtabi* de kê raştê na rewşe yenî: “Xizirî miradê ma ard hurêndî” (Çiya, 2020, 112). Na cumle hikayeya “Riyê Çemi” de vêrena û qarekter vano ke Xizirî miradê înan ca ardo.

2. Rîtuêlî Ke Derheqê Xizirî De Yî

Derheqê Xizirî de zaf rîtuêlî est î. Roceyê Xizirî, qawita Xizirî, loqmeyê Xizirî, mîyazê Xizirî nînan ra yî. Gama ke yew, edebîyatê Zazakî ra eseran biwano raştê înan yeno. Bitaybetî nuşttoxê Elewîyî nê babetan ra zaf ehemîyet danî û eseranê xo de ca danî înan. Ma cêr de yewbiyew nê babetan ser vîndenî.

Semedê Elewîyan **roceyê Xizirî** zaf muhîm o. Xora zaf Elewîyî roceyê Remezanî nêgînî. Zeki Uyanîk û Arif Kala benetî Elewîyan de yew cigêrayîş kenî. Na xebate de yew armancê înan zî benetî Elewîyan de roceyê Remezanî girewtîş zaf û yan toy o tespît kerdiş o. Goreyê xebata netîce no yo: %88 qet nêgînî, %7 ge-ge gînî, %5 timutim gînî (2012, 132). Seke aseno roceyê Remezanî benetî Elewîyan de zaf toy o. Herênda ci de roceyê Xizirî û roceyê Miherremî est o. Elewîyî semedê Xizirî 13ê, 14ê û 15ê sibate de roceyê Xizirî gînî (Rençber, 2010, 401).

Edebîyatê Zazakî de zî ca dayîyeno roceyê Xizirî. Mîsale romanê *Gula Çemê Pêrre* de nê melumatî yenî dayîş: “Çeleyo pîl ke xo pey de verda, kewtî menga gucîge, nara kî Roje û Roşana Xizirî amêne. Sey Gaxanî, Xizir de kî hîrê rojî roje ra dime roşane bîye. Cîranan eynen sey Gaxanî Xizir de kî nîyaz potêne, dêne derûcîranî” (Çem, 2019, 270). Roman de zî vacîyeno ke însanî hîrê rocî roce gînî. Hîrê rocî ra dima zî roşan est o. Însanî roşanî bimbarek kenî û nîyaz danî cîrananê xo.

Romanê *Pîltane* pey roceyê Xizirî dest pêkeno û behsê toy rîtuêlan zî beno:

Roja peyên a rojeyê Xizirî... Zerîfa dest-rîyê xo şutî, qilmê awe çarnaye bi xo ser de, çileyî berdî serê banî de fiştî pa, duayê xo kerdî, keleyê xo kemera keleka lojine ra birna û ameye zere. Zere de di lajê xo yê qijî û Pîltane verê soba de ronîşte bîy. Lew na bi destêdi qijkêkan ra, Pîltane kî paçî kerde û henî fek de duayî bi milmilnayîş hetê kulinde ser şîye ke sîfre bîyaro seba fitara hazir bikero... Halbukî pîl-qij her kesî fitara ra aver ke dest-rîyê xo şutî lew nayêne destê domanan ra, dima fitara xo kerdêne ra... Ê pîlê ke tim hêrsin ê, tim qehirin ê, tim danê domanan ro, çitur beno ke wextê fitara de hende vurîyenê, hende benê nerm! (Aldatmaz, 2016, 9).

Seke aseno rocanê Xizirî de pîlî dest û rîyê xo şuwenî û lewe nanî destê gedeyan ra. Ê pîlî ke timutim mirûzin, hêrsin î rocanê roceyî de nerm benî û gedeyan rê hurmeto pîl nawnenî. Nê çiyî zî weş bi gedeyan şonî û ê, benetî xo de huyenî. Heta teqlîdê pîlan kenî û sey înan destê yew bînan maçî kenî. Roman de derheqê roceyê Xizirî de sewbîna melumatî zî yenî dayîş. Nînan ra yew derheqê zewacî de yo. Goreyê nê bawerî, ezebî ke roceyê Xizirî gînî û awe nêşiminenî hewnê xo de yan destê yewî ra yan zî yew ca de awe şiminenî. Destê kamî ra awe bişimî ci rey de zewecînî û kamca de awe bişimî qîsmetê înan weyra yo. Coka Zerîfa nêwazena Pîltane awe bişima: “Pîltana mi ti nêbo awe bişimê, emşo şewa peyên a cîgera mi, to roceyê xo kî girewto, awe meşîme, hela ti hewnê xo de kamcîn hetî ser şona, kotî awe şimena” (Aldatmaz, 2016, 10). A wazena bander bibo ke keynaya aye kamcîn ca de û destê kamî ra awe şiminena. Pîltane zaf teyşan bena la hewna zî zor dana xo û teyşan rakuwena. Hewnê xo de cîya cîya însanan weynena û destê keso ke rîyê ey çinî yo ra awe şiminena û pey tersî haya bena. Raşt a zî heyatê aye de zewac û eşq aye rê zaf derd û zehmet ano. Yanî hewnê aye yew het ra raşt vecîno.

Romanê *Moriber* de zî behsê têqilî zewac û roceyê Xizirî beno: “Qurbani zafinî kênekonê azebo kerdênî vîla, kokimo ki cî rê düay kerdênî. Ya ‘qebul bo’ ya Heq miradê to bikero’ ya ki lex’a ‘lacê to bibo, namê xo bîlbîl bo, jüyo gîrpîzîn bo, derî ra everdî gındır bo’ vatênî” (Aslan, 2011, 167). Aşma Xizirî de însanî teyna roce nêgînî qurbanan zî birnenî. Hîna zaf keynekê ezebî goştê qurbanan vîla kenî. Çunkî ê zanî ke însanî semedê miradî înan rê dua kenî. Heta toy extîyarî yarî kenî û çîyanê mîzahîyan vanî.

Yew rîtuêl zî **qawita Xizirî** yo. Roca peyên yê roceyê Xizirî de însanî qawite pewcenî. Qawite xele, awe, sole û riwen ra virazîyena. Verî xeleyî awe de yenî girênayîş. Badê halo wişk de tehnîyenî û riwen de sole rey de yenî terriqnayîş (Hamarat, 2017, 124). Însanî qawite dekenî zereyê sînî û na sînî şewe yan mitbaxe yan zî yewna ca de ronênî. Serê sibayî ewnînî eke qawite ser de rêçe est a vanî Xizir ameyo keyeyê înan û şa benî. Heta toy cayan de eke rêça linge est a însanî qurban birnenî. Çunkî vanî na serre bibereket vîrena (Dikme, 2018, 84-85). Edebîyatê Zazakî de zî behsê qawita Xizirî beno. Hikayeya “Gaxan”a ke kitabê *Vîndîbîyaye* de ca gîna de derheqê na babete de nê rêzî vîrenî:

-Ya Xizirê qilawuzê deryayî, ya Xizirê gelek û gemîya, ti milaketê şerî risqê ma ra dûrî fiye.

Maya mi serê ardan kerd ra pê ostome (spatula) kerd rind rakerde verda. Mi va:

-Dayê ti çira serê ardan henî verdana?

Mi ra va:

-Çêna m’ ma Xizir bi Astoro Qirî ra fetelîno beno ke raya xo çeyê ma ra kî bivêro. Eke çeyê ma ra ke vêrd ra şî, nîşanê xo serê ardan ra verdano (Demîrel, 2014, 11).

Seke aseno maye, ardan pey spatula akena û dîqat kena ke qet rêçe nêmano. Keynaya aye nê çî meraq kena û wazena ke sebebê ci bander bibo. Maya aye zî qale ana Xizirî û vana ke beno ke Xizir keyeyê înan zîyaret biko û yew rêçe verdo. Romanê *Pîltane* de zî kê raştê qawita Xizirî yenî:

Pê tîre serê qawite kerd duz, legane berde kaleka andalî de, erd de naye ro. Dormeyê legane de, çend cayî de çilayî fîştî ra ci û duayê xo kerdî, şîye, kewte cile. Çend serrî yo Zerîfa qawita Xizirî virazena ke Xizir bêro keyeyê înan û serê qawite de yew nîşan ca verdo la heta nika Xizirî ne dest

nayo bi qawite ra ne kî linga estorê xo yê qirî... Zerîfa ke bîya nêbîya hîna nêdîyo ke Xizir ameyo keyeyê kesî. Ancî kî tim qawita xo virazena û bi hêvî Xizirî pînena” (Aldatmaz, 2016, 114).

Ewta kê raştê yewna realîte zî yenî: Hama Xizir na dewe de nêşîyo keyeyê kesî. Ênsanî bawer kenî ke Xizir toy keyeyan zîyaret keno û înan rê bereket ano. La tû kesî hama serê qawite de rêça Xizirî nêveynayo. Hewna zî ênsanî bawerîya xo dom kenî û nê rîtuêlî anî ca.

Rocanê Xizirî de çîyanê muhîman ra yew zî **nîyazê Xizirî** yo. Toy cayan de nîyaz sey mîyaz zî name beno. Nîyaz bawerîya Elewîyan de zaf muhîm o û zaf çî îhtîwa keno. Mîsale ênsanî wexto ke şonî zîyaran xo het de toy çîyanê werdî zî benî. Qurbanî ra vêşêr heme çîyî ra vacîyeno nîyaz. Nîyazo tewr muhîm nan o. Ênsanî goreyê şertanê ekonomîyê xo cîya cîya nanan pewcenî. Kesî ke halê înan baş o nano riwenin kesî ke halê înan baş nîyo nano sacî pawcenî (Çem, 2011, 91). Heto bîn de gama ke ênsanî şonî cem xo rey de çîyanê werdî benî înan ra zî vacîyeno nîyaz û peynî cemî de nê werdî vila benî. Roşanê Gaxanî de zî ênsanî nan yanî nîyaz pewcenî û vila kenî. Toy nîyazan zî benî zîyaran. Hîkayeya “Gaxan”î ke kitabê *Vîndîbîyaye* de vêrena de behsê ney beno: “Ya Xizirê serê gelek û gemîya, ya Xizirê seeta tenge, ti ya ke çeleyê zimistanî de estorê xo fina hewa tozike vay dana. Bê camêrdîye. Ma raya to de no nîyazê xo powto, berîme biresnîme çêverê çewresî... Roşanê Gaxanî bî. Maya mi hîrê rojî roje girewtîbî. Ewro nîyaz pewt” (Demîrel, 2014, 9). Ênsanî roşanê Gaxanî de gama ke şonî zîyaran ser xo rey de nîyaz zî benî û hem weyra hem de dewe de vila kenî. Nîyazan ra yew zî nîyazê Xizirî yo. Nîyazo ke rocanê Xizirî de vila beno ra vacîyeno nîyazê Xizirî. Ênsanî rocanê Xizirî de semedo ke yewbînan rê wayîr vecî û têqîlîya xo, cîranîya xo pêt bikî nîyaz pewcenî û derûdorî rê vila kenî. Xususe misayîbî nîyaz pewcenî û keyeyê yewbînan zîyaret kenî. Hîkayeya “Mîyazê Xizirî”î ya ke kitabê *Teberik* de ca gîna de behsê ney beno: “Delal ver bi şanî ez şona keyeyê misayîbê xo, mi rê mîyazê Xizirî pewje ez bigêrî berî... Di serrî yo ê ênê keyeyê ma, emser zî ez şorî înan bivînî” (Çîçek, 2010, 38). Hîkaye de Xidir wazeno ke nîyaz bîgo û şo keyeyê misayîbê xo. La zimistan o û heme ca binê pûk û vewre de yo. Xanima ey nêwazena o, nê şertan de keye ra vecîyo û şo dewa bîni. La Xidir semedo ke şertanê bawerîya xo bîyaro ca nîyaz gîno û kuweno rayîr. La rayîr de vewre û pûk zaf o û rayîrê xo vîndî keno. Nêzano kancîn het ser şo. Peynî de zî binê vewre û pûkî de ridê ser dî

ra mireno. Wexto ke mireno nîyaz gîno destanê xo zere. Seke aseno Xidir canê xo semedo ke misayîbê xo rê nîyaz bero û rîtuellanê bawerîya xo bîyaro ca feda keno.

Rîtuellan ra yew zî **loqmeyê Xizirî** yo. Loqmeyê Xizirî yan roca peyên yê roceyê Xizirî de yanî roca pancşeme yan zî roca bîn yanî roca êne pewcîyeno. Însanî nê loqmeyî pîya hedernenî û vila kenî. Loqme zaf cayan de pey ardî, şekir, ruweno keke, hingimên, goze û findiqe ra virazîyeno. Pey nê çîyan mîr elawîyeno û badê zî pewcîyeno. Loqme sembolê bereketê Xizirî, ardimkerdişî û yewîyeyî yo (Uğur, 2023, 11). Heta zaf cayan de cemê Xizirî virazîyeno û insanî weyra badê cemî loqmeyê Xizirî vila kenî. Însanî wexto ke loqme vila kenî pawenî ke waştîşê înan zî ca bîyo. Edebîyatê Zazakî de hikayeya “Dayîke” ke kitabê *Sewdaya Belekine* de ca gîna de no kontekst de ca dayîyeno loqmeyê Xizirî. Hikaye de badê veşnayîşê yew dewe hem mêrdeyê hem zî keyneka yew cenî kişîyenî. Di lacê cenî zî vindî benî. Cenî des serrî ra vêşêr gedeyanê xo geyrena la cayêk de zî înan nêveynena. La hevîya aye dom keno û geyrayîşî ra fek veranêdona. Nê wextan de çîyêk zî kena. Keye bi keye geyrena û werdî, şîrone çîna bikuwo destê aye arê dana û bena zîyaran ser vila kena. Armancê aye no yo: “No parso ke ez arê dana, bena zîyaran ser o vila kena. Loqmeyê Xizirî yo, beno ke cayê de vêreno” (Tekîn, 2013, 20). Yanî a vana ke belkî rocêk Xizir nê çîyan ra yewik biwero û gedeyanê înan aye rê bîyaro. Bawer beno ke Xizir ge-ge sey însano feqîr xo eşqera keno û insanan ra ardim wazeno. Xizir waştîşê kesî ke ey rê ardim kenî û çîyêk danî ca ano. Çîyo ke Xizir insanan ra gîno rê zî vacîyeno loqmeyê Xizirî. Cenî loqmeyê Xizirî dima ya û hêvî kena ke rocêk Xizir destê aye ra zî çîyêk gîno û a resena gedeyanê xo.

3. Taybetmendîyanê Bînan Yê Xizirî û Eseran De Ekskerdişê Înan

Eseran de ca dayîyeno sewbîna taybetmendîyanê Xizirî. Mîsale Xizir pey toy sifetan name beno û na rewşe eserane de zî veynîyena. Nameyanê Xizirî ra yew **Xiziro Kal** o. Semedo ke Xizir sey insanêko extîyar tesawur beno ey ra vacîyeno Xiziro Kal. Kitabê *Gula Xizirî* de nê şîran de Xizir sey Xiziro Kal name beno: “Çi Wazena Ma Ra”, “Derbaz Bena”, “Nêverdane”, “Tofan Bero”, “Xasbahçe De”, “Seba Mi Ra”, “Yar Kero”, “Xo Tadana”, “Hevalî”, “Serê Koyî Ra”, “Nêweş A”, “Meerze”, “Deftera Dila”, “Hewar”, “Gula Xo.” Ma eşkenî şîra “Tofan Bero” sey nimune bidî: “Şahad Xiziro Kal beno / Zonê fesada lal beno” (Başî, 2012: 21). Romanê *Gula Çemê Pêrre* de zî eynî name vêreno: “Xiziro Kal, Xizir o ke suyarîye Astorê Qirî her tim harme û baskê to ser bo” (Çem, 2019, 277). Nameyan ra yew zî **Kalo Sipî** yo. Hewna semedo ke Xizir sey insanêko

extîyar yanî însano ke erdîşê, zimbêlê û porê ey sipî bîyî tesawur beno ey ra vacîyeno Kalo Sipî. Şîira “Yar Kero” ke kitabê *Gula Xizirî* de vêrena de nê rêzî vêrenî: “Xiziro Kal qelbê to mi rê har kero / Kalo Sipe sala to mi rê yar kero” (Başî, 2012: 53). Seke aseno toy cayan de hem nameyê Xiziro Kal hem zî Kalo Sipî pîya şuxulîyenî. Eynî rewşe romanê *Gula Çemê Pêrre* de zî est a: “Xiziro Kal, Xizir o ke suyarîye Astorê Qirî her tim harme û baskê to ser bo... Kalo Sipê yo bimbarek bêro comerdîye, rayîrê şima rakerone” (Çem, 2019, 277-278).

Nameyanê Xizirî ra yew zî **Xizirê Kelek û Gemîyan** o. Hikayeya “Şiliya Usari” ke kitabê *Reuka Doy* de vêrena de no name şuxulîyeno: “Ya Xizirê Khêlek u gemiya, şima kesi tenge de nêverdê! Ma u cirananê mara xirabe duri berê!” (Koêkorta, 2001: 33). Eynî kitab de hikayeya “Us u Ase” de zî behsê têqilîya Xizir û kelek û gemî beno: “Wa Xizirê kêlek u gêmîya şima de bo!” (Koêkorta, 2001: 65). Toy însanî wexto ke Xizirî ra ardim wazenî yan zî sewbîna kesane rê dua kenî têqilîya Xizir, kelek û gemî xo vîr ra nêkenî û pêron pîya şuxulnenî. Yanî se ke vacî Xizir senê hewa kelek û gemîyan rê rayîr nawneno, rewşanê xiraban ra înan muhefeza keno eynî hewa hem ma hem zî şinasîyanê ma zî muhefeze biko û ma rê rayîr binawno. Kitabê *Vîndîbîyaye* de zî eynî kontekst est o: “Xizir o, hazir û nazir o. Serê gelek o gemîyan der o. Qey tenga ma nêvîna. Bê comerdîye” (Demîrel, 2014, 30). Nê cumleyî hikayeya “Qendîl” de vêrenî û qarektera hikayeyî tengane de ya. O wext Xizir yeno vîrê aye û vana qeyê Xizir aye rê ardim nêkeno. Xora yew taybetmendîyê Xizirî zî wextanê tenge de insanan rê ardim kerdiş o. Coka ey ra **Xizirê Saeta Tenge** vacîyeno. Romanê *Gula Çemê Pêrre* de no name şuxulîyeno: “‘Ya Xizirê saeta tenge! Ya qilawuzê serê Koyê Sulvisî, ya Baxira Sipîye’ vat, o ra dime nameyê xeylê zîyaranê bînan dard we û winî kewtî zere” (Çem, 2019, 66). Qarektera romanî wexto ke duayan kena nameyê şexsîyetanê muhîman şuxulnena û semedê Xizirî zî vana Xizirê saeta tenge. Eynî name şîira “Vengê Hîris û Heştî” ya ke kitabê *Wextê Heskerdişî* de vêrena de zî est o: “Ez ‘hîris û heşt’ de ya / Dest û çimê mi giredaye yê... Veng bide Xizirê roja tenge” (Topaç, 2013, 67). Nuştuxe weynena ke însanî dec ancenî coka Xizirî ra ardim wazena û vana ke nê decan biqedênî.

Wendoxî eseran ra bander benî ke Xizir wayîrê estorî yo. Coka toy eseran de ey ra **Asparê Bozî** vacîyeno. Yanî rengê estorê Xizirî boz o coka ey ra Asparê Bozî vacîyeno. Şîira “Xapnena” ke kitabê *Gula Xizirî* de vêrena de kê raştê nê nameyî yenî: “Şahadê minê tu yo Asparê Bozî” (Başî, 2012: 34). Heto bîn de toy eseran de vacîyeno ke rengê estorê Xizirî qir o. Hikayeya “Gaxan” a ke

kitabê *Vîndîbîyaye* de ca gîna de no melumat est o: “Çêna m’ ma Xizir bi Astoro Qirî ra fetelîno beno ke raya xo çeyê ma ra kî bivêro” (Demîrel, 2014, 11). Wayîrê estorî bîyayîş elametê lez bîyayîşî yo. Wextanê verênan de însanan hîna zaf heywanî sey estor, her û deve semedê resî şuxulnayêni. Xora goreyê toy bawerîyan eşqera bîyayîşê Xizirî ge-ge sey hewa û va beno. Hewa û va zî cayê xo lez bedelnenî. Hîkayeya “Dewres Alîyê Manqilî” ya ke kitabê *Cer Hard Cor Asmen* de vêrena de behsê nê bawerîyî beno: “Alîê Manqilî çua xu sanite ra, wairê çêi re vat: ‘Mordem, wurce hao Xizir amo verê çeberê tu, wurce çeber ci rê rake!’ Mordem seke wuşt ra çeber kerd ra, zerrê çêi u zerrê Alîê Manqilî bî honik. Alîê Manqilî vat: Ya Xizir tu esta!” (Astore, 1994, 94-95). Hîkaye de vacîyeno ke Alîyê Manqilî yew însano dewrêş o û Dêrsim de her kes ey şinasneno. O rocêk şono misafirî û weyra wayîrê keyeyî ra vano ke Xizir fekê berî de vinderteyo û ey ra wazeno ke wa ber ako. Wexto ke ber abeno çew nêaseno la hewayo honik dekuweno zere û no hewa zereyê însanan zî honik keno. Bi îma vacîyeno ke Xizir xo nêaweno la sey hewa dekuweno zereyê keyeyî. La hewna zanîyeno ke Xizir hîna zaf sey însano feqîr xo eşqera keno. Romanê *Silema-Î* de behsê ney beno: “Taê vanê Xizir jê mordemê neçar, jê mordemê bêkeş, jê mordemê fiqari yeno çeverê yisony” (Mirza, 2004, 66). Coka bitaybetî wextanê verênan de wexto ke feqîrî berê însanan bîcenî zaf kesî înan destveng nêrşawitêni. Vatêni belkî o Xizir o.

Yew taybetmendîyê Xizirî zî însanî ey sey hekîm veynenî. Şîra “Bêta’mul O” ke kitabê *Gula Xizirî* de vêrena de kê raştî ney yenî: “Hekîmê ma timî Xizir bo” (Başî, 2012, 85). Nuştux Xizirî sey hekîmo tewr pîl veyneno û wazeno ke Xizir timûtim hekîmê înan bo. Hîkayeya “Xizirê Zereyê Ap Mistefayî” ya ke kitabê *Solê Sûrî* de ca gîna de zî eynî fikr îfade beno: “Dermanê derdan o. Pîyê feqîr û fiqaran o. Bêkes û bêkêsan rê pî û bira yo. Hevalê roja tenge yo” (Beytaş, 2014, 64). Xizir heme derdan rê derman beno û feqîr û fiqaran rê wayîr vecîno. Heto bîn de bawer beno ke Xizir însananî xiraban rê zî ceza dano. Şîra “Çi wazena Ma ra” ke kitabê *Gula Xizirî* de vêrena de behsê nê fiqrî beno: “Xiziro Kal fesad û şeytanî qahr kero” (Başî, 2012, 10). Nuştux şîre de vano ke dînya de însanê fesad û şeytanî zaf î û înan rexne keno. La zano ke quwetê înan nê însanan rê bes nêkeno. Coka wazeno ke Xizir înan qahr biko.

Nameyê Xizirî ge-ge sey nîda şuxulîyeno. Toy mintiqayan de însanî wexto ke dekuwenî hîsanê sey kelecane, ters, ecêbmendiş sey nîda nameyê Xizirî vanî. Hîkayeya “Hewnê Merdene” ya ke

kitabê *Trena Ğelete* de vêrena de na rewşe esta: “Mı va, ya Xızır, hard ra kemere gurê tune, sanune çareyê heşî ro” (Çiya, 2024, 40). Hikaye de qarekter wexto ke raştê heşî yeno zaf terseno û pey kelecana vano “ya Xizir” û kerra erzeno heşî. Ge-ge zî Xizir sondan de ca gîno û “Xizir bo!” vacîyeno. Hikayeya “Xase Tuşk” a ke kitabê *Bırrhêdar* da ca gîna de qarekter nê qalan ano ziwan: “Xızır bo, çika inam kena yî ya sond wena ke, mı tuşk nasnêkerd” (Gümüş, 2024, 18). Qarekter wexto ke wazeno keso bîn ey rê bawer biko vano “Xizir bo!” Yanî Xizirî xo rê şahid nawneno. Kitabê *Vana* de zî eynî ifade vêreno: “Xızır bo, heni kota ra mı vir ke / desta sodır xo ra şermayeno” (Jêle, 2020, 20). Nê rêzî şîira “Roê Mı” de vêrenî û wexto ke şîir de hîsî qarekterî eşkera benî hewna Xizir şahid nawnîyeno.

Peynîye

Şexsiyetê dînî û mîtolojîkî zaf welatan de est î û nê kesî kulturê, bawarîyê mîletan rê tesîr kenî. Xizir inohewa yew kes o. Anatolya, Balkan, Rojhelato Mîyanin û Asyaya Mîyanin de derheqê ey de bawerîyî û vateyî est î. Goreyê Zazayan zî o yew keso zaf muhîm o. Coka edebîyatê modern yê Zazakî de zî kê raştê Xizirî yenî. Çende Xizir hem semedê Sunîyan hem zî semedê Elewîyan yew şexsiyeto muhîm bibo zî gama ke ma edebîyatê Zazakî de eseran ra ewnîni hîna zaf nuştoxê Elewîyî eseranê xo de ca danî Xizirî. Elewîyî bawer kenî ke ziwan û tonê înan ziwan û tonê Xizirî yo. Cayê înan zî wareyê Xizirî yo.

Gama ke wendoxî ewnîni eserî ke Zazakî nusîyayî ra zaf taybetmendîyanê Xizirî weynenî. Mîsale zaf eseran de Xizir sey keso ke ey ra ardim wazîyeno nawnîyeno. Çunkî gama ke însanî behsê Xizirî bikî qala verêna ke yena vîrê înan “ardim” a û edebîyatê Zazakî de zî kê raştê eynî rewşe yenî. Derheqê Xizirî de zaf rîtuêlî est î û wendox nê rîtuêlan edebîyatê Zazakî de zî weyneno. Roceyê Xizirî, qawita Xizirî, nîyazê Xizirî, loqmeyê Xizirî nê rîtuêlan ra yî û edebîyatê Zazakî de toy eseran de biteferuat behsê nê rîtuêlan beno. Semedê Xizirî cîya cîya nameyî şuxulîyenî. Wendoxê edebîyatê Zazakî eseran ser ra bander benî ke Xiziro Kal, Kalo Sipî, Xizirê Kelek û Gemîyan, Xizirê Saeta Tenge, Asparê Bozî nê nameyan ra yî. Hewna eseran ser ra wendoxî bander benî ke Xizir sey hekîm weynîyeno û însananê xiraban rê zî ceza dano.

Çimeyî

- Arpa, A. (2012). Zazaca'nın Kürtçe'yi Anlama Yeterliliği, II. Uluslararası Zaza Tarihi ve Kültürü Sempozyumu Bildiri Kitabı. edt. M. Varol, içinde (541-554). Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.
- Aslan, C. (2011). Moriber. İstanbul: Kardelen Yayıncılık.
- Astare, K. (1994). Cer Hard Cor Asmen. İstanbul: Weşanxaneyê Doz.
- Başî, X. (2012). Gula Xizirî. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Beytaş, A. (2014). Solê Sûrî. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Boratav, P. N. (2012). Türk Mitolojisi. Ankara: BilgeSu Yayınevi.
- Çem, M. (2011). Dêrsim Merkezli Kürt Aleviliği (Etnisite, Dini İnanç, Kültür ve Direniş). İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Çem, M. (2019). Gula Çemê Pêrre. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Çınar, A. A. (2020). Alevilerde Hızır Kültü ve Ritüelleri, Millî Folklor, 126, 63-74.
- Çiçek, M. (2024). Pune. Bîngol: Weşanxaneyê Vir.
- Çiçek, A. A. (2010). Teberik. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Çiya, S. (2001). Her Çi Beno Sanike. İstanbul: Weşanxaneyê Tij.
- Çiya, S. (2020). Hirê Kıtabi. Bîngol: Weşanxaneyê Vir.
- Çiya, S. (2024). Trena Ğelete. Bîngol: Weşanxaneyê Vir.
- Demîrel, L. (2014). Vîndîbîyaye. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Dikme, N. (2018). Pülümür ve Çevresindeki Halk İnanışları. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Felsefe ve Din Bilimleri Anabilim Dalı.
- Döğüş, S. (2015). Anadolu'da Hızır-İlyas Kültü ve Hıdrellez Geleneği, Türk Kültürü ve Hacı Bektaş Veli Araştırma Dergisi, 74, 77-100.
- Eren, H. (2011). Dil ile İnsan Sferi Arasındaki İlişki, I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu Bildiri Kitabı. edt. M. Varol, içinde (433-453). Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.
- Ertuğrul, M. (2021). Mûsâ Peygamberin Yol Arkadaşı Hızır'ın Kimliği, Yakın Doğu Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, 7/2, 293-332.
- Gedik, A. (2012). Roj Ma De Şewle Dano. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Gündüz, D. (2000). Kılama Pepûgî. Ankara: Weşanxaneyê Vartan.

- Guntaş Aldatmaz, N. (2016). Piltane. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Gümüş, A. (2024). Bırrhêdar. Bîngol: Weşanxaneyê Vir.
- Hamarat, H. (2017). Bingöl Alevi Toplumunda Halk Kültürü Unsurları. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Bingöl Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı.
- Jêle, B. (2020). Vana. Bîngol: Weşanxaneyê Vir.
- Koêkorta, M. (2001). Reuka Doy. İstanbul: Weşanxaneyê Tij.
- Kur'ân-ı Kerim'in Türkçe Meali. (2012). haz. İ. Atasoy, Ü. Şimşek, M. Paksu, C. Uşşak, İstanbul: Nesil Yayınları.
- Mergariji, H. (1996). Budelaê Gırşi. İstanbul: Pirevi Yayıncılık.
- Mirza, Y. (2004). Silema-I. Frankfurt: Nameyê weşanxane çinî yo.
- Öztürk, M. (2003). Bilge Kul-Musa Kıssası ve İslam Kültüründe Hızır Mitosu, Ondokuz Mayıs Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, 14/14, 245-281.
- Rençber, F. (2010). 40 Soruda Adıyaman'da Geleneksel Alevilik, Türk Kültürü ve Hacı Bektaş Veli Araştırma Dergisi, 56, 395-406.
- Sertkaya, İ. (2013). Sosine û Gulîzare. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Tekîn, E. (2013). Sewdaya Belekine. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Topaç, B. (2013). Wextê Heskerdişî. İstanbul: Weşanxaneyê Vate.
- Türk, H. (2013). Nusayrîlerde Hızır İncancı, Türk Kültürü ve Hacı Bektaş Veli Araştırma Dergisi, 54, 225-242.
- Türkdoğan, D. (2004). Alevî İslâm İncancı İçerisinde Hz. Hızır, Hacı Bektaş Velî Araştırma Dergisi, 29, 19-26.
- Tüzün, M. (2012). Désımu De Deyri-Lawuki-Şuari-Hewai, II. Uluslararası Zaza Tarihi ve Kültürü Sempozyumu Bildiri Kitabı. edt. M. Varol, içinde (161-194). Bingöl: Bingöl Üniversitesi Yayınları.
- Uğur, Ç. (2023). Alevi-Bektaşî İncancında Hızır Orucu ve Ritüelleri, İlahiyat Alanında Akademik Çalışmalar. edt. F. Rençber, M. S. Uzundağ, içinde (1-15). Ankara: Gece Kitaplığı.
- Uyanık, Z. ve Kala, A. (2012). Ardahan İli Alevilerinde Kendini Tanımlama, İbadet ve Öteki Algısı, Akademik Araştırmalar Dergisi, 52, 109-144.